

## Li vir hûn li navnîşana dirust in

Pirsên we hene? Têkiliyê bi me re deynin!

Rêxistina Perwerdeyê ya Abûriya Saksonya Jêrîn ya neqezenckirinê GmbH (BNW)  
Benzstraße 27  
38446 Wolfsburg

Kesa ji we berpirsyar li wir:

**Kerstin Schlüsselburg**

Telefon: 05361 46468-32

Faks: 05361 46468-60

E-Mail: [kerstin.schluesselburg@bnw.de](mailto:kerstin.schluesselburg@bnw.de)

## Hûn dê wisa me bibînin

Girêdana bi alavên veguhastinê yê giştî ve: Hêla 212, ber bi aliyê Vorsfelde Süd ve, wîstgeha WVG, her 30 xolekan carekê otobûsek ji cihê rawestana otobûsan ya jimare 6 an 8 her weha ji tirênxaneyê sereke, rawestgeha 13 diçe



[www.bnw.de](http://www.bnw.de)



Bildungswerk der  
Niedersächsischen Wirtschaft  
gemeinnützige GmbH

## Li ser BNW

Rêxistina Perwerdeyê ya Abûriya Saksonya Jêrîn ya neqezenckirinê GmbH (BNW) di dirêjahiya pirosêsa jiyana fêrkirinê de bi ciwan û mezinan re ye di nav de arasteyên pîşeyî, û xwendina berdewam ya nêzîkî praktîkê û pêşvebirina şiyanan û pêşxistina şiyânên sereke.

Ev bêhtirî 50 salan e, BNW wek dezgeha perwerdeyî ya arasteya paşerojê her sal piştewaniya nêzîkî 41.000 mirovan dike, ji bo naskirina şensên xwe yê pîşeyî û şiyânên xwe pêş bixin.

Bi 1.100 karmendên xwe li 57 cihan, BNW yek ji mezintirîn pêşkêşkerên xizmetên perwerdeyî li Saksonya Jêrîn e.



Das BNW ist ein anerkannter Träger gemäß SGB III bzw. der Akkreditierungs- und Zulassungsverordnung Arbeitsförderung (AZAV). Das BNW ist gemäß DIN EN ISO 9001:2015 zertifiziert.

[www.bnw.de](http://www.bnw.de)



Bildungswerk der  
Niedersächsischen Wirtschaft  
gemeinnützige GmbH

## Rahênanên koçberiyê

### Li Wolfsburg

Ev bername ji aliyê Navenda Karî ya bajarê Wolfsburgê ve tê piştewanîkirin



## Armanc

Bi „Rahênanên koçberiyê“ em dixwazin delîveyê bidin we ku hûn rewşa jiyana xwe ya niha baştir bikin û hûn paşeroja xwe ya malbatî û pîşeyî li ser binyatekî mukum ava bikin. Em ji we re dibin alîkar ku hûn nerînên xwe yê pîşeyî pêşve bibin û bi hêsanî helûmercên jiyane derbas bikin.

Daku hûn bikarin bi hêsanî jiyana pîşeyî, dibistanê û ya taybetî bi hev re rêkbixin, rahênerên me li dor hemû pirsên girêdayî jiyana rojane şewirmendiyeke berfirek pêşkêşî we dikin.

Xizmeta me ye taybet e û li gorî pêwîstiyên we yê kesane tê guncandin.



## Naverok

- Rahêneriya kesane ya ku tevahiya malbata we vedigire
- Destnîşankirina pirsgirêkên dibe ku rûbidin û peydakirina çareseriyên di atmosfêreke gengeşa nehênî de
- Li gel cûna jivanan (bo nimûne: seredana damûdezgehên Dewletê)
- Pêşkêşkirina alîkariyê li dema derkeftina pirsgirêkên jiyana rojane ya li dibistanê ji bo zarokên malbata we
- Agahî li dor bernameyên şewirmendiyê yê cur bi cur li Wolfsburgê û derdora wê
- Pêşvebirina nerînên nû yê pîşeyî
- Amadekirin ji bo jiyana karî li Elmanyayê
- Rêkûpêkkirina belgeyên we yê serlêdanê û rahênanîkirin ji bo hevpeyivînên karî
- Lêgeryan ji bo peydakirina xolên pîşeyî an jî cihên karî û deynana têkiliyan di gel xwediyên karan
- Pêşxistina şiyane sereke û medyayê

## Bi awirekî

### Grûpa armanc

Rahênanên koçberiyê ji bo malbatên koçber ên ku li navenda karî ya Wolfsburgê qeydkirî ne.

### Beşdarbûn

Beşdarbûna di rahênanên koçberiyê de piştî şewirîne bi navenda karî ya Wolfsburgê re mumkin e.

### Dem

Dema beşdarbûnê 3 – 12 heyva ye. Jivanên rahênan hefiyane hene û bi awayekî kesî jî dikarin bêt çêkirin.

### Baş e ku hûn van tiştan bizanin

Li gor pêwîstiyê ji bo jivanê rahênanê wergerek tê û ji bo ji hev têgehiştinê dibe piştevan.

### Ma gelo hûn dixwazin beşdar bibin?

Peywendiyê bi me re yan bi karmendê/a berpirsyar ji we li navenda karî li bajarê Wolfsburgê re deynin.

Em kêfxweş in bi beşdarbûna we.